

## Komara Kurdistanê û bandora wê li ser ji nû ve avakirina civaka şoreşger

Ji nû ve avakirina civaka şoreşger, pêvajoya berdewamkirin û nûkirina taybetmendî, nirx, rêkxistin, hizir û baweriyên şoreşgerî di civakê de ye, ku di heyamên cuda yên dîrokî de, bi taybetî piştî şoreşê, bi merema parastin û berdewamiya hizir û armancên şoreşgerî pêk tê.

Dom»R:5





## Fakter, qonaxên giştî û astengên li ser rêya avakirina Dewlet-Netewe

Pêkanîna welatek bo neteweyekî bê dewlet, proseyeke dijwar û demdirêj e ku hewcehî bi fakterên cur bi cur heye. Ev proseya bi hêsanî nayê pênasekirin û girêdayê bi rewşa taybet a dîrokî, civakî, siyasî û cografî ve heye.

Lê em dikarin hinek ji wan fakter û qonaxên giştî li wir gengeşe bikin.

Dom» R:4


*Bidesîveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî

www.agirimedia.org Hejmar (487)09-02-2025 Buha (1000) Tûmen





## Giringiya yekrêziya kurdan bo Gelê kurd û paşeroja Sûriyê

Piştî pitir ji 60 salî li ser kodetaya leşkerî ya Partiya Be'is ya nijadperês di sala 1963 an de li ser desthilatdariya Sûriyê, herwiha piştî nêzîkî 14 salan ji destpêkirina şoreşa xelkê Sûriyê li dijî vê rêjîma nijadperês û desthilatdariya wê ya diktatur, di 08.12.2024 an de hate rûxandin. Di van çardeh salên dawiyê de û bi sedema berdewamiya zordestiya rêjîmê û çaresernekirina pirsgirêkên Sûriyê û bersivnedana daxwazên Gelên Sûriyê bi giştî û di nav de daxwazên Gelê Kurd .......

Dom» R:6

# Daxuyaniya Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta bi dawîhatin a serkevtiyaneya Kongireya 17 (Kongireya Yekgirtina Dêmokratan)

**Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta birêveçon a Kongireya 17, daxuyaniyek belav kir**

**Hevwelatiyên xoşewîst!**
**Xelkê niştimanperwerê Kurdistanê!**
**Kom û komel û aliyên siyasî yên Îran û Kurdistanê!**
**Endam û alîgirên emegnasê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îtanê!**

Bi keyfxweşiyê ve birêveçona serkevtiyane ya 17emîn Kongireya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê(Kongireya Yekgirtina Dêmokratan) bi we radigehînin.

Êwara roja 15ê Rêbendana 1403 a Rojî(3ê February 2025), Kongire bi beşdariya hemû endamên Kongirê (endamên rêberî, nûnerên hilbijartiyê endaman, kadr û pêşmergeyên Hizb û rêkxiravên Hizbê li derveyî wekat û Herêma Kurdistanê), Kongireya 17 a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li jêr navê "Kongireya Yekgirtina Dêmokratan" de karê xwe dest pêkir.

Li destpêka karê Kongirê de û piştî strandina sirûda netewiya "Ey Reqîb" û ragirtina bîstek bêdengî bo rêzgirtin ji canê paqijê Şehîdên Kurd û Kurdistanê, peyama destbikarbûna Kongirê ji aliyê rêzdar "Xalid ezîzî", Berdevkê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê hate pêşkêşkirin.

Rêzdar "Xalid Ezîzî" li peyama xwe de tevî îşarekirin bi qonaxên




"Duh" û "Îro" yên Hizba Dêmokrat û dûrdîmena vê Hizbê li "Sibê"ya xebat û tekoşînê, bas li pirs û nirxa yekgirtina Dêmokratan kir û hevgirtin û yekgirtina bi daxwaziya giştî ya xelkê Kurdistanê û endam û alêgirên Hiuzba Dêmokrat da zanîn.

Berdevkê Hizbê li beşeke din a axaftinên xwe de îşare bi hewcehiya bixwedeçon û diyarîkirina şaşî û kêmasiyên derbasbûyî, pêdegirî li ser erkê endamên Hizbê û çalakvanên navxweyê welat li anînemeydana îde û afirankariyên nû, parastina vekhevî û bihêzkirina xebat û tekoşîna siyasî û medenî li navxweyê welat de kir.


Rêzdar "Xalid Ezîzî" li dawiya peyama xwe de bi îşarekirineke kurt li ser rewşa tejî qeyran a komara îslamiya Îranê, pêdegirî li ser xweamadekirina xelkê li navxweyê welat û endamên Hizba Dêmokrat bo rûberûbûn digel eger û senariyoyên pêş û paşî herifîna rêjîmê wek erk û hewcehiyeke bo xebata niha kiriye.

Dom» R:2



## Yekimîn Pilênoma Kumîta Navendî a hilbijartî li Kongira 17 a Hizba Dêmokrat birêve ço

Dom » R:2



## Pêwîstiya Stratejîk a Piştgiriya Serweriya Siyasî ya Gelê Kurd

Dom » R:3

# Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta birêveçon a Kongireya 17, daxuyaniyek belav kir

**Doma R:1**

Li qonaxeke din a karê Kongirê de rapora Heyeta Amadekirina Kongirê ji aliyê rêzdar “Kemal Kerîmî”, Berpirsê Heyeta Amadekirina Kongirê ve, bi beşdarên Kongirê hate pêşkêşkirin. Rêzdar “Kemal Kerîmî” li destpêka raporê de bi îşarekirin bi sedemên paşkevtina Kongirê û vê rewşa ewlehî ya piştî serîhildana tevgera “Jîna”yê bi ser Hizba Dêmokrat de sepiya, bi hûrî bas li pêvajoya birêveçon a Konferansên Kongirê û hilbijartina nûneran bo Kongirê û proseya bi encamgihandina karûbarên Kongirê kir.

Piştî pêşkêşkirina rapora Heyeta amadekirina Kongirê û vergirtina dengê hitbarê ji endamên Kongirê bo rewatîdan bi Kongirê, kurtiyek ji rapora siyasî ya rêberiya Hizbê ji aliyê rêzdar “Mistefa Hicrî” berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê ve hate pêşkêşkirin. Rêzdar “Mistefa Hicrî” li destpêka raporê de tevî pîrozbahîkirin a destbikarbûna karên Kongireya Yekgirtina Dêmokratan li beşdarbûyên Kongirê û giringîdan bi pirsa yekgirtina Dêmokratan li ser pêvajoya xebat û tekoşînên Hizbê, kurtiyek ji rapora siyasî ya rêberiya Hizbê pêşkêş kir.

Berpirsê Navenda Birêveberiya Giştî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê li vê raporê de bi îşarekirin bi encamgihîştin a serkevtiyaneya proseya yekgirtin a Dêmokratan û serhildana tevgera “Jîna”yê, şiyan û zerfiyetên vê tevgerê û berçavanîn a dûrdîmena tevgera siyasiya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê, rohnkirin li ser dawî guherînên dever, Îran û Rojhilatê Kurdistanê dan. Vî rêzdarî bi hilsengandin û lêkdana bûyerên piştî 7ê October 2023 û sikesta startejiya komara îslamî li deverê, bas ji rewşa rêjîmê li asta navnetewî, deverî û navxweyê welat kir.

Beşeke din a rapora siyasî ya rêberiya Hizbê bo hilsengandina rewşa xebata nasnamexwaziya xelkê Kurdistanê hatibû diyraîkirin, li vê beşê de bilindbûna asta hişariya netewî, yekîtiya li navbera çîn û qatên civakê, geşekirina xebata medenî û giştî û berçavtirbûna rola jinan û ciwanan, bi taybetmendiyên îroya xelkê Kurdistanê binav kir.

Rêzdar Mistefa Hicrî li dawiya pêşkêşkirina rapora siyasî ya rêberiya Hizbê bo Kongirê, bas ji dîtingeh û rêkara Hizba Dêmokrat a Kurdistanê bo Îran a paşerojê kir û li vê derheqê de, berdewambûn li xebat bo bidestveanîna maf û azadiyên netewî yên xelkê Kurdistanê li çarçoveya Îranek federal û cehdkirin bo komkirina hêzên dêmokrat û pêşkevtinxwaz ên opozîsiyonê bi erkê bingehîn ên rêberatiya bê ya Hizbê da zanîn.

Piştî pêşkêşkiirna rapora siyasî ya rêberiya Hizbê, dore gihîşte axaftin û basên endamên Kjongirê li sewr xal û bendên taybet bi biryarên Kongirê ku li rewş û hewayek dêmokratîk de endamên Kongirê hizir û dîtingeh û pêşniyarên xwe bo erêkirinê anîne berbas.

Her ji vê beşa karê Kongireya 17 a Hizbê(Kongireya Yekgirtina Dêmokratan) de bi dengê hitbardana endamên Kongirê rapora siyasî, biryarname û hejmarek ji belgeyên din ên Kongirê ku bi pêka lihevkirina her du aliyên Dêmokrat, li ser rêkevtin li ser kiribûn, wek bername û pêyrewa navxweyê Hizbê, hate erêkirin.

Beşa dawî ya karê Kongireya Yekgirtina Dêmokratan de, hilbijartina endamên bingehîn û cihgirê Komîteya Navendî bû ku li vê beşa karê Kongirê de jî pêvajoya rikeberiyek serast û dêmokrat de bi awayê serkevtiyane gihîşte encamê.

Hogir û alîgirên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê!

Bê şik, paşkevtina birêveçon a Kongireya 17 a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, ku bi keyfxweşiyê ve bi “Kongireya Yekgirtina Dêmokratan” hate navdêrkirin û dibe wek cîbicîbnûna yek ji bingehîtirîn bendên rêkevtina li navbera Dêmokratan bê dîtin, dilnigeranî bo gelek kes û aliyan, bi taybet bo endam î alîgirên Hizba me çê kiribû. Niha ku bi keyfxweşiyê ve bi ragihandina dawîhatin a serkevtiyaneya Kongirê, Hizba Dêmokrat karî bi ser lemper û pirsgirêkên li ser rêya lidarxistina Kongirê bi ser bikeve û nigeraniya xelk, endaman û alîgirên xwe bi dawî bîne, bi pêka sirûşta Kongireyê û rewşa siyasî ya tevgera Kurd û guherînên li Îranê, qonaxeke tejî erk û tekoşîn li pêşiya me ye.

Komîteya Navendî ya hilbijartiya Kongireya 17 a Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê(Kongireya Yekgirtina Dêmokratan) bi hilkefta birêveçon a serkevtiyaneya Kongirê, pîrozbahî li hemû têkoşeran, endaman û hogirên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê dike û gazî tevahiya refên Hizb û hemû dost û dilsozên vê Hizbê û xelkê Kurdistanê bi giştî bo piştevanîkirin li rêberiya Hizbê li cîbicîkirina biryar û pêspartiyên vê Kongireyê dike.

Komîteya Navendî ya Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê

**16ê Rêbendana 1403 a Rojî**

**4ê Şibata 2025 a Zayînî**

# Yekimîn Pilênoma Kumîta Navendî a hilbijartî li Kongira 17 ê a Hizba Dêmokrat anku “Kongira Yêkgirtina Dêmokratan” birêve ço

Yekimîn civîna Kumîta Navendî a hilbijartî li Kongira 17 ê a Hizba Dêmokrat ku nav jê kongira Yêkgirtina Dêmokratan bû, roja Pêncşemiyê 6 ê Şibata 2025 an bi beşdariya endamên eslî û cêgirên Kumîta Navendî hat lidarxistin. Destûra karê vê civînê, hilbijartina Sikirtêrê Giştiyê Hizbê, hilsengandina kar û barê Kongirê diyarîkirina karên girîng û hewceye Kumîta Navendiya nû li xwe girtibû.

Li para yekim a civînê de rêzdar Mistefa Hicrî bi tebayîya dengên endamên Kumîta Navendî weke Sikirtêrê Giştî ê Hizbê hate hilbijartin. Kak Mistefa Hicrî Sikirtêrê Giştî ê Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, li yekemîn gotara xwe a piştî hilbijartina xwe de, bi hilkevta dawîpêhatina serkevtiyane a kongirê, pîrozbahî pêşkêşî endamên Hizbê û tev xelkê Kurdistanê kir û rêz û pêzanîna xwe û rêberiya Hizbê bo wan rêzdaran anî ziman ku gelek bi dilsozî û nevestane ji bona lidarxistina serkevtiyane a Kongirê, erk kêşabûne ustiyê xwe.

Herwisa sipasiya Endamên rêberiya berê a Hizbê kir ku li heyamê berpirsayetiya xwe de , nevestane ji bona bi cî gihandina erkên hizbiye xwe û ji hemiyê girîngtir bo girtina Kongirê bi hemî şiyana xwe cehd kirin.

Li parekî din a karê Pilênoma Kumîta Navendî de, Kumîta Navendî tevî pîrozbahî kirin li tev Endam, alîgir û hogir û piştîvanên Hizba Dêmokrat a Kurdistana Îranê, ragihand ku li jêr tîrêja rênimayî yên biryar û raspartiyên Kongira Yêkgirtina Dêmokratan, û bi ilham vergirtin ji navê Kongirê, li pêxema bidestveanîna armancên diyarîkirî, ji xebat û têkoşîna Hizbî û ji bona pêşxistina tevgêra siyasî a Kurd li Rojhilatê kurdistanê bi rijdî bixebitin.

Bo vê armancê jî tevî tekezî li ser hindî zêdetir bihêzkirina yêkitiya nava refên Hizbê û berçavgirtina hemî şiyan û zerfiyetên nava Hizbê, bi giringîdan bi hewcehiya yêkitiya hêzên siyasiye Rojhilatê Kurdistanê û berdevamiya xebatê bo geheştina bi vê armancê, li serhev xistina hêza xebatkarên Ro-



jhilatê Kurdistanê li pêxema xebata hemî aliyane a netewî li hember rêjîma komara Îslamî de dê bike ewlewiyeta kar û bernama karê xwe.

**Kumîta Navendî a Hizba Dêmokrat a Kurdistana îranê**

**6 ê Şibata 2025 a Zayînî**

# Pêwîstiya Stratejîk a Piştgiriya Serweriya Siyasî ya Gelê Kurd



**N. Dr. Mecîd Heqî**



Di dilê Rojhilata Navîn de, ku gelek caran sînor tên nîqaşkirin û tifaq lê nazik in, gelê Kurd weke sembola berxwedan û xwerêveberiyê radiweste.

Kurd tevî ku mezintirîn koma etnîkî ya bê dewlet in li cîhanê, ji mêj ve ye ku cihê xwe yê rast di nexşeya jeopolîtîk de bêpar hiştine.

Li Tirkiye, Sûriye, Iraq û Îranê belav bûne, ziman, çand û dîrokeke hevpar parve dikin, lê dîsa jî bi sînorên ku piştî Şerê Cîhanê yê Yekem hatine cixîzkirin, hatine dabeşkirin.

Têkoşîna Kurdan ji bo otonomiyê ne tenê meseleyeke herêmî ye, ji bo îstîqrara global û demokrasiyê bandorên girîng hene.

Ji bo welatên wek Îsraîl û dewletên rojavayî, naskirin û piştgirîkirina daxwazên kurdan ne tenê hevgirtinê ye, di heman demê de pêdivîyeke stratejîk e jî.

Gelê Kurd li hemberî dijwariyan cesaret û pêşengiyeke bêhempa nîşan da.

Rola wan a bingehîn di têkbirina DAIŞ de şiyana wan a parastina ewlehiyê li herêmek ku ji aliyê tundrewiyê ve lê tê kişandin nîşan da.

Rêveberiya Kurd a li Bakurê Sûriyeyê ku bi navê Rojava tê naskirin, bi rêveberiya xwe ya demokratîk, wekheviya zayendî û polîtîkayên xwe yên tevnegerî naskirina navneteweyî bi dest xist.

Herêmeke Kurdî ya bi hêz û bi îstîkrar dikare bibe berevajîkirina rejîmên otorîter ên Tirkiye û Îranê. Ji Israelsraîl, ev çîrokek paralel a zindîbûn û berxwedanê pêşkêşî dike.

Piştgiriya xwerêveberiya Kurdan dikare bibe alîkar ku avahiyek hêzê ya hevsengtir li Rojhilata Navîn, ewlehiya xwe ya Israelsraîl zêde bike û di heman demê de demokrasî û aramiya herêmî pêş bixe.

Lê belê rêya otonomiya Kurdan bi dijwariyan re tije ye. Tirkiye di dijberiya her şêwe dewletbûna Kurdan de rijd e û wê weke metirsî li ser yekparçeyiya axa xwe dibîne.

Li Îranê nifûsa Kurd bi tepisandina çandî ya sîstematîk re rû bi rû maye, di heman demê de serhildanên dawî bi çewisandinên hovane re rû bi rû mane.


Herêma Kurdî ya Sûriyê piştî vekişîna hêzên Amerîkî xisar dimîne, ligel êrîşên Tirkiyê xewna wan a rêveberiya xweser aloztir dike.

Hikûmeta Herêma Kurdistana Iraqê (KRG) belkî mînaka herî nêzîk a xweseriya kurdan e, bi parlamentoya xwe û hêzên xwe yên leşkerî.

Tevî pêşketinên berçav, nakokiyên navxweyî û nakokiyên bi Bexdayê re li ser dahatên petrolê û kontrolkirina xakên sinûrî berdewam dikin ku aramiya wê asteng dikin.

**Divê dewletên rojavayî girîngiya Kurdan a stratejîk bidin nasîn. Ew di şerê li dijî terorîzmê de hevkarên pêbawer bûne, ji bo rêveberiyek herêmî ya bi bandor li deverên ku lê nakokî hene nexşeyek pêşkêş dikin.**

Rojava bi avakirina herêmeke kurdî ya bi îstîqrar dikare pêşkeftina aborî pêş bixe, metirsiya radîkalbûnê kêm bike û nirxên demokratîk li Rojhilata Navîn teşwîq bike.




Ewropa jî ji piştgiriya Kurdan sûdê werdigire. Îstîqrara li herêmê dikare belavbûna pevçûnan li Ewropayê kêm bike û ji bo bazirganî û veberhênanê bazarên nû ava bike.

Divê Yekitiya Ewropa di navbera parastina têkiliyên bi Tirkiyeyê re û parastina mafên mirovan ên gelê Kurd de hevsengiyê bibîne.

Pirsgirêka Kurd ji bo paşeroja Rojhilata Navîn navenda wê ye. Piştgiriya xwerêveberiya Kurdan ne tenê ji bo rastkirina xeletiyên dîrokî ye, ew pêngavek ber bi herêmek ewletir û dewlemendtir e.

Ji bo Îsraîl, Yekiyiya Ewropa û civaka navneteweyî ya berfireh rawestana li gel Kurdan veberhênana aştî, aramî û edaletê ye.

# Fakter, qonaxên giştî û astengên li ser rêya avakirina Dewlet-Netewe



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko



Pêkanîna welatek bo neteweyekî bê dewlet, proseyeke dijwar û demdirêj e ku hewcehî bi fakterên cur bi cur heye. Ev proseya bi hêsanî nayê pênasekirin û girêdayê bi rewşa taybet a dîrokî, civakî, siyasî û cografî ve heye.

Lê em dikarin hinek ji wan fakter û qonaxên giştî li wir gengeşe bikin.

**Fakterên karlêker li avakirina Dewlet-netewe:**

- Nasnameya netewiya hevpar - hebûna nasnameyek netewî a hevpar li ser bingeha ziman, çand, dîrok, ol a fakterên etnîkî, yek ji girîngtirîna hewcehiyên pêkanîn û avakirina "Dewlet-Netew"ekê ne, ev nasnama netewî, seha bawerî û girêdayîbûna hevpar a kesan bi hev, bihêztir dike û riya yekgirtin û yekîtiya netewî xweş dike.

- Xwest û daxwaziya giştî - hebûna xwestek û daxwaziyek gîştiya bihêz bo avakirina dewletek serbioxwe, yeke din ji fakterên girîng e.
ew daxwazî dibe li nav piraniya xelkê de hebe û bi rêya xwenîşandan, mangirtin, hilbijartin û çalakiyên medeniyên din ve bê nîşandan.

- Piştevaniya navnetewî - piştevanîkirina welatên din û rêkxiravên navnetewî, dikare rolek girîng li alîkarîdan û bi fermînasîna dewletek nû hebe da ku xwe li meydana navnetewî de cihgîr bike û cih pê xwe qahîm bike.

- Hebûna rêkxistinên siyasî û civakî

- hebûna rêkxirsavên siyasî û civakî yênj bi hêz wek hizban, hêza çekdar û rêkxistinên medenî, dikare alîkarderê rêkxistina xebata rizgarîxwazane û birêvebirina karûbarên welat, piştî avakirina dewletê bide.

- Hebûna çavkaniyên sirûştî û aborî

- hebûna çavkaniyên sirûştî û aborî dikare alîkarderê serbixwyiya aboriya welatê nû bie û ji girêdahiya wî welatî bi welatên din kêm bike.

**Qonaxên giştî yên avakirina Dewlet-Netwe:**

- Hişariya netewî - bilindkirina asta hişariya netewî û seha nasnameya hevpar li nav xelkê de.

- Xebata Rizgarîxwazane - Rêkxistina xebata aşîtîxwazane an çekdarane bo gihîştin bi serbixweyiyê.

- Pêkanîna dewletek demkî - pêkanîna dewletek demkî bo birêvebirina karûbarên welat li dewreya derbasbûn.

- Birêvebirina hilbijartina azad û dadperwerane - birêvebirina hilbijartina azad û dadperwerane bo hilbijartina nûnerên xelkê û avakirina dewleta hilbijartî.

- Bi fermînasîna navnetewî - bidestveanîna bi fermînasîna ji aliyê welatên din û rêkxiravên navnetewî.

**Rikeberî û lemper:**

Rêgirîkirina dewletên dagîrker - dewletên dagîrker bi hemû hêza xwe rêgirî ji serbixweyiya netewên jêr destê xwe dikin û ew mezintirîn asteng e.

Netebayîya navxweyî - hebûna dijheviya navxweyî li ser pirsa etnîk, ol, siyasî û idelojî, dikare tevgera serbixwexwaziyê lawaz bike û bibe asteng li ser rêya avakirina dewletek yekgirtî ya nû.Kirîzên aborî - pirsgirêkên aborî, girêdayîbûn bi welatên din, dikare ji şiyana aramî û geşeya dewleta nû kêm bike.
Gefên ewlehî - gefên ewlehî ji aliyê welatên cîran an girûpên terorîstî, dikare bibe sedema nearamî û ewlehnebûna welatê nû.

**Mînakên dîrokî:**

Hindistan - tevgera serbixwexwaziya Hindistanê bi rêberiya "Mahatma Gadî" bi mifahvergirtin ji şêwazên aşîtîxwazane, karî birîtaniyayê neçar bi bicêhiştina Hindistanê bike û bibe sedema pêkanîn û avakirina dewleta serbixwe ya Hindistanê.

Elcezayir - şerê Elcezayir an şoreşa Elcezayir bi hejmarek ji şerên li navbera Firanse û azadîxwazên Elcezayirê ye li dijî dagîrkeriya Firansê ye ku li nvbera salê 1954 heta sala 1962 a Zayînî qewimî û li encamê vê serbixweyiya Elcezayirê bû.

Yek ji taybetmendiyên wî şerî, bikaranîna her du aliyan ji "îşkencekirinê"ê bû.

Tevî ku hêza Firansê li wî şewrî de bi ser kevt, lê rewş ber bi wî aliyî ve ço ku êdî nekarî rêgirî ji serbixweiuya Elcezayirê bike. Şoreşa Elcezayirê digel şoreşa Firansê û şoreşa Rûsiyê, mezintirîn şoreşeên sedsala 20an bû.
Li şoreşa Elcezayirê de 55 heta 60 hezar hêzên serbazî û nêzî milyonek ji xelkê medenî hatine kuştin.

Hevdem milyonek Ewropayî ji Elcezayirê revîn û hejmareke zaf ji wan Ewropayiyan ku ti rolek li şer de nebûn, bi sedema guherînên li Elcezayirê û bi sedema dîtingeha xelkê Elcezayir li derheq Ewropayiyan, hatine kuştin û tol ji wan hate hildan.

ya balkêş ev e ku xelkê Elcezayirê bi 8 sala xebat li dijî welatekî bihêze wek Firansê, gihîştine serbixweyiya xwe, çimkî wan hemûyan bi tenê yek daxwaz hebû, daxwaza "serbixwebûn"ê.

**Encam:**

Pêkanîna Dewlet-netewe, proseyek demdirêj û dijwar e ku hewcehî bi têkoşîn û fîdakariyeke zêde ji xelkê ye. Serkevtin li vê proseyê de girêdayî bi gelek fakterên cur bi cur heye ku nabe ti yek ji wan bê piştguhavêtin.

# Komara Kurdistanê û bandora wê li ser ji nû ve avakirina civaka şoreşger



N. Serbest Urmiye

Ji nû ve avakirina civaka şoreşger, pêvajoya berdewamkirin û nûkirina taybetmendî, nirx, rêkxistin, hizir û baweriyên şoreşgerî di civakê de ye, ku di heyamên cuda yên dîrokî de, bi taybetî piştî şoreşê, bi merema parastin û berdewamiya hizir û armancên şoreşgerî pêk tê. Pêvajoya han di berdewambûna têkoşîn û pêşvebirina armancên şoreşgerî de roleke bingehîn dibîne û girêdayî hin fakteran e ku her ye k ji van bandora xwe li ser vê pêvajoyê hene.

Îdeolojiya şoreşgerî yek ji eslên bingehîn e di ji nû ve avakirina civaka şoreşger de. Ev îdeolojî bi di bingeh de şiroveya komek ji nirx, pirensîb û îdealan dike ku gel yank u em bêjin mirov ji bo serxistin û cihgîrkirina wan şoreşe dike. Divê ev ku ev nirx û bihyên han nifş bi nifş werin veguhestin da ku hertim civaka şoreşger li ser pê ragirin û şores li dijî newekhevî û zilm û zorê berdewam be. Di vê rêyê de jî perwerdeya aliyên cuda yên çandî û rewşenbîrî û şoreşgeriyê û herwiha ragihandin û xorttkirina çanda şoreşgeriyê di civakê de roleke bi bandor dibîne.

Di Komara Kurdistanê de îdeolojiya şoreşê li ser bingehên azadî, mafê çarenivîsê, wekheviya civakî û nasnameya netewî ya Kurd, pêkhatibû dimeşiya. vê îdeolojiyê ji bilî ku tekoşîna azadîxwaziyê di nava şoreşgerên kurd yên heyamê Komara Kurdistanê de xurtir kir, belkû bû mîrateke bi nirix bo nifşên paşerojê jî ku weke hêzeke emegnas di pêxema serxistina armancên komara Kurdistanê de berdewam di çeperê şoreşê de bimînin.

Di rastî de îdeolojiya Komara Kurdistanê karî li hember zextên navxweyî û derve de li ber xwe bide û civakeke şoreşger qonax bi qonax di Kurdistanê berhem bîne.

**1-.** Ji nû vejandina armancên şoreşgerî û rola wê di nû kirina civaka şoreşger de, Ji nû vejandina armancên şoreşgerî di nû kirina civaka şoreşger de rolek girîng heye û dikare di rêya rêkxistin û dameziranding navendên perwerdehiyê, ragihandinê û piştgiriya navneteweyî de pêk were û li gorî bandorek bi hêz li ser têkoşîn û bihevre girêdana taken civakê, civakeke şoreşger û xurt ava bike. Dema ku ev armanc bi berdewamî werin zindîkirin, dê civaka şoreşger bikaribe têkoşîna xwe bidomîne û serkeve.

**2-** Di Komara Kurdistanê de vejandina armancên şoreşgerê bû sedema bihêzbûna nasnameya netewî ya Kurd û avakirina komarek serbixwe li ser esasên azadî û dadperweriya civakî. Vê pêvajoyê karî berxwedana civakî û siyasî di nava gelê Kurdistanê de xurt bike û veguhêze nifşên paşerojê.

**3-** Xurtkirina rih û ramana berxwedanê û ji nû ve avakirina civaka şoreşger, Hebûna riha berxwedan û berxwedayînê di civakeke şoreşger de mercê berdewambûn û serkevtinê ye. Ev hest û raman tenê li hemberî zextên hundir û derve de nine ku alîkariyê dide têkoşînên şoreşgeran, belku di ji nû ve avakirin civaka şoreşger de jî rolek girîng dibîne û xwedî bandor e. Hindî ku riha berxwedanê di civakê de xurt be, ev qas civak armancên xwe yên şoreşgerî xurtdike û li hember dijwariyan de bêtir li ber xwe dide.
Komara Kurdistanê bi xurtkirina rihê berxwedanê di nava gelê Kurd de karî modeleke berxwedanê ji bo nifşên paşerojê biafirîne. Ev raman ne tenê bû seema berdewambûna tekoşînê di ware neteweyî û azadîxwaziyê de, belku û sedem ku Kurdistanê li hember zordarî û dagîrkeriyê de jî di asteke bilind de tekoşîna xwe bidomîne.

**4-** Nifşên nû û nûkirina civaka şoreşger, Rola nifşên nû di ji nû ve kirina civaka şoreşger de girîng e. Divêt ev nifş bi îdeolojî û armancên şoreşê werin zane û perwerdekirin. Di heman demê de bivêt ku li hember arîşeyên civakî û siyasî jî berxwe bidin. Perwerdekirina nifşên nû û xurtkirina hizir a şoreşgerî di nava ciwanan de yek ji girîngtirîn aliyên vê pêvajoyê ye.



Di Komar û herêma Kurdistanê partî û tevgerên siyasî hewil dan û didin ku nirx û girîngiya azadî û serxwebûnê nifş bi nifş nûjen bikin . Ev pêşkewtina perwerde û çandî bû sedem ku nifşên nû yên Kurd bi armancên Komara Kurdistanê hîn bibin û ji bo pêkanîna wan têbikoşin.


**5-** Rêkxistin û partiyên siyasî û rola wan di nûjenkirina civaka şoreşger de, Rêkxistin û partiyên siyayî yên şoreşger di nû kirina civaka şoreşger de xwedî roleke xurt in. Ev dikarin hizir û bîrên şoreşê pêşve bibin û di rêya perwerde, propaganda û bernameyên siyasî de yekîtî û hevgirtinê di civaka şoreşger de berhem binin û xurt ragirin.
Komara Kurdistanê bi avakirina rêkxistin û partiyên siyasî alîkariya bi hêzbîna têkoşîna şoreşgerî ya gelê Kurd kir. Van rêkxistinan bi berdewamî berevanî ji ramanên şoreşê kirine û karîne bandorê li ser geşekirina tevgerên şoreşgerî li Kurdistanê û bi taybedî Rojhiltê Kurdistana danên. Bandora wan bi xasmanî di xurtkirina nasnameya siyasî û neteweyî ya Kurdan de berçav e.

**6-** Bandora rewşa civakî û aborî li ser nûkirina civaka şoreşger, Rewşa civakî û aborî jî yek ji fakterên ber çav e di ji nû ve avakirina civaka şoreşger de e. Nerazîbûna gel a ji ber xizaniyê, newekheviyê û nebûna dadperweriya civakî dibe sedema pêkhatin û berdewamiya tevgerên şoreşger. Rewşa han bi taybetî li Kurdistanê de bandorek mezin li ser geşkirina têkoşînên şoreşger hebûye û heye.
Di Komara Kurdistanê de navendên aborî û civakî karîbûn heya qaseke baş li hember arîşe û pirsgirêgên aborî û civakî de alîkariya gel bikin û civaka Kurdistanê li serhildana pirsgirêkên zêde û aloz biparêzin. Navendên han di xurtkirina rih û ramana berxwedanê û tekoşîna li dijî zilm û zoriyê de roleke girîng dîtîn û bi awayekî xuya bandor li ser ji nû ve avakirina civaka şoreşger a Kurdistanê danîn.

**Gotina dawiyê**

Komara Kurdistanê weke ezmûneke dîrokî di qada ji nû ve avakirina civaka şoreşger di Kurdistanê de, bi berhemanîna ramana azadî, serbxwebûn û dadperweriya civakî, afirandin û bi hêz kirina rihê berxwedan û pêşveçûne û her wiha û bi rêxistina civaka şoreşger di Kurdistanê de, xwedî pêgeheke mezin û roleke bingehîn e di berdewambûna şoreş û têkoşînên rizgarîxwaziyê û damezirandina navend û rêkxistinên civakî û çandî di seranserî Kurdistanê de. Ev destkevtên Komara Kurdistanê heya niha jî di tekoşîna siyasî û civakî ya gelê Kurd de bi bandor xwedî bandor in weke sembo dê ji nifşên paşerojê re jî bimînin.

# Giringiya yekrêziya kurdan bo Gelê kurd û paşeroja Sûriyê



N. Ebdûlazîz Qasim




Piştî pitir ji 60 salî li ser kodetaya leşkerî ya Partiya Be'is ya nijadperês di sala 1963 an de li ser desthilatdariya Sûriyê, herwiha piştî nêzîkî 14 salan ji destpêkirina şoreşa xelkê Sûriyê li dijî vê rêjîma nijadperês û desthilatdariya wê ya diktatur, di 08.12.2024 an de hate rûxandin.

Di van çardeh salên dawiyê de û bi sedema berdewamiya zordestiya rêjîmê û caresernekirina pirsgirêkên Sûriyê û bersivnedana daxwazên Gelên Sûriyê bi giştî û di nav de daxwazên Gelê Kurd bi piştgirtin û piştevaniya Îranê ji aliyekî û ji aliyên dîtir bi gefên Tirkiyê bi taybetî li dijî Gelê Kurd, ku destêwerdanên Îran û Tirkiyê digel zordariya rêjîmê bû egerê peydabûna qeyraneke mirovî, abûrî û siyasî ya mezin, nemaze di welatekî wekî Sûriyê de, yê di binyatê xwe de lawaz û paşkeftî û digel nebûna jêrxaneke aborî bihêz, herwiha ku her ji destpêka desthildariya rêjîma Be'is û zêdetirî 60 salî ku hîç awirek bo çareserkirina pirsgirêkan nehatiye dan, berovajî vê yekê ku rêjîmê herdem hewl dide ku li ser kirîz û aloziyan bijî, lewra hebûna xwe li ser aloziyan ava dikir û ji ber vê yekê kar dibû ji bona zêdekirina aloziyan û heta zemînek peyda bû bo peydabûna bi dehan rêxistinên terorîst li Sûriyê hevdem digel nebûna opozîsyoneke demokrat û azadîxwaz ku bibe şûngir û alternatîf bo vê rêjîma diktatur.

Wek me dît ku aliyên siyasî yên kurdî di demê borî de hindek derfetên zêrîn jidest dan û tevî serkeftinên leşkerî yên hêzên kurdî li dijî rêxistinên terorîst û bi taybetî dastana efsaneyî û dîrokî ya rizgarkirina Kobanê ji aliyê Pêşmerge û Şervanên YPG û herwiha dastana dîrokî ya têkşikandina rêxistina Daişê li Boxozê, lê mixabin hêzên siyasî yên kurdî nikarîn wan serkeftinan di qada siyasî û navneteweyî de bikar bînin û têxin di berjewendiya Gelê Kurd de li hember dagîrkeiya Tirkiyê û çeteyên wê yên terorîst li çeperên Efrîn û Serêkaniyê û Girêspî.. Piştî dagîrkirina Efrînê hêzên siyasî yên kurdî li şûna bi yekrêziya kurdî mijûl bibin, zêdetir nakokiyên hizbîsiyasî û heta yên îdeolojî dane pêş û nikarîn hîç destkeftek neteweyî bidest bêxin, ne ligel rêjîmê û aliyên navdewletî û heta ne ligel opozîsyonê jî, ku ev nakokiyên di navbera ENKS û PYD de ketin di berjewendiya neyarên kurdan de û bi taybetî ku dagîrkeriya Tirkiyê gelek qazinc ji van nakokiyan dît, û gelek navçe û bajarên kurdistanê ji aliyê wê û çeteyên wê ve hatin dagîrkirin û ku heta niha jî ti asoyek bo bi dawîkirina vê dagîrkeriyê li ser wan navçeyên kurdî nîne.

Îro; piştî rûxandina rêjîmê, careke dîtir daxwazên rêkxistina nêvmala kurdî li nav şeqama kurdî bi xurtî hatin bilindkirin û mijara diyaloga kurdî-kurdî dubare bû, tevî mijara pêkanîna şandeke kurdî ya hevbeş û rêkeftin li ser bernameyek niştîmanî li ser mafên rewa yên Gelê Kurd ketine rojevê û bûne navunîşanên serekî yên îro, hevdem ku serkeftina însiyatîfa Amerîkî-Firnsî bo dubarekirina prosêsa diyaloga kurdî-kurdî dê bibe derfetek zêrîn û rêxweşker bo bihêzkirina rola kurdan li ser masaya danustandanan digel hikumeta demekî ya Sûriyê û herwiha beşdarîkirina kurdan di hikumeta nû de çareserkirina doza Kurdî li Sûriyê, ku niha li gorî hindek nûçeyan ku gavên giring hatine pêkanîn di navbera herdû aliyên serekî yên kurdî de û rêkeftin bûye li ser van mijarên gerim û di demek nêzîk de û her dîsa bi piştevaniya Amerîka û Fransa dê herdû aliyên kurdî bi şandeke hevbeş dest bi gotûbêjan ligel Şamê bikin, û tê pêşbînîkirin ku însiyatîfa Fransî-Amerîkî berdewam be û bi encamên erênî serbikeve nemaze ku gelek dewletên Ewropî û Herêma Kurdistanê û hemû aliyên kurdistanî tevlî vê însiyatîfê bûne û piştgiriya yekrêziya kurdî dikin di vê qonaxa hestyar û dîrokî de.

**Îro gavek mezin û dîrokî hat pêkanîn û divê ev yek wekî destkefteke neteweyî pîroz bê parastin, ku tevlî ziyanên mezin yên li Kurdistana Sûriyê ketîn, ev yekrêzî pêgehê kurdan bihêz dike û zêdebarî ku hêjî çend kaxezên bihêz di destê kurdan de hene, ji wan kaxezan; dosaya gaz û neftê û herwiha mezintirîn bendav li Sûriyê, ku niha Tirkiyê bi hemû hêza xwe hewl dide vê bendavê komtrol bike û ji dest hêzên HSD derxie ji bo lawazkirina pêgeha kurdan li ser masayên danustandinan di Sûriya paşerojê de, lê bi yekrêziya kurdî dê gelek rê bêne girtin li pêş êrîşên Tirkiyê û çeteyên wê.**

Helbet ku kontrolkirina bendeva Tişirînê ji aliyê Tirkiyê ve dê ne tenê bibe fakterê lawaziya kurdan, herwiha wê bibe fakterê lawaziya hikumeta Şamê jî li hember xwest û zêdegaviyên Tirkiyê di karubarên navxweyî û siyaseta Sûriyê de, nemaze ku Tirkiyê piştî rûxandina rêjîma Esed û guhertina li Sûriyê bi awayekî berbiçav, dixwaze ji serdema nû jî sûdmend be, bi rêya bidestxistina girêbestên jinûveavakirina Sûriyê, ku ev yek dê bi sed milyar dolaran bigehîne gencîneya Enqereyê, ji bilî berfirehkirina bandora xwe ya jeopolîtîk li ser hesabê lawaziya Sûriyê (ku niha dewletek herifî û têkçûyî ye), hevdem wekî axaftina Wezîrê Derve yê hikumeta demkî ya Sûriyê Esa'd El-Şêbanî di çarçova korbenda Aborî ya Cîhanî 2025 li Davosê gotibû: ku "Me dewleteke têkçûyî ji rêjîma Esed wergirt, bê sîstemeke aborî ...", Şêbanî di axaftina xwe de karnameya hikumeta xwe eşkera kiribû ku desthilatên nû dê bala xwe bide li ser pênc armancên serekî di nav de wize û energy ku çavkaniya van herdû çavkaniyên aborî di dest kurdan de ye (Bendevên Ferat û mezintirîn kêlgehên neft û gazê li parêzgeha Hesekê û kêlgeha Omer li Dêrazorê), ku bêyî van herdû jêderan ti hikumetek nikare projeyên avdankirinê desteser bike, lewra dikarin bêjin ku şerê Tirkiyê li dijî kurdan li ser tevaya xelkê Sûriyê ye û li ser hesabê avdankirin û seqamgêriya Sûriyê ye, ku zêdexwaziyên Tirkiyê dê rêgiriyê li nûavakirina Sûriyê bi giştî bikin û li vir pirsek xwe pêşniyar dike; gelo helwestên hêzên navdewletî çî ye?

Bi taybetî Amerîka û Fransa û Israel dê paşeroja Sûriyê radestê Tirkiyê bikin û rê bidin ku Enqere zal bibe li ser deramet û saman û herwiha îradeya xelkê Sûriyê yan jî wê rê bigirin li pêşiya zêdexwaziyên wê wekî çawa rê hatin girtin li pêş Taranê û Hizibulah?.

## Nerîna



**“Peyvdar Xalid Ezîzî”:**

**“Mafê Kurdan e ku bêje, tevî van hemû şiyan û amadebûna ji bo alternatîf, lihevkirin û heta rêveberiya hevbeş a Îranê û hwd., eger em mafên xwe di hundirê Îranê de nas nekin. Mafê vî gelî heye ku ji bo pêkanîna daxwazên xwe rêyên din pêşniyar bike”**



**“Benjamin Netanyahu”:**

**“Em ê bi Trump re nexşeya Rojhilata Navîn “bêtir û baştir biguherînin”**



**“Volodymyr Zelenskyy ”:**

**„Guftûgoyên Amerîka û Rûsyayê yên bêyî Ukraynayê gelekî metirsîdar in”**



**“Ehmed Şerî” :**

**“Erebistana Siûdî dê di vegerandina Sûriyê de roleke girîng bilîze”**

# Avakera Komara Kurdistanê 17’emîn kongireya xwe lidar xist!



**N. Eskender Ceiferî**

Tevî hemû givaş û hereşeyên dagirkariya Tehranê, Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê di rojên derbasbûyî de 17’emîn kongireya xwe lidar xist. Ev givaş û hereşe xuya dikin, dibe ku di demeke nêz de hevkêşeyên mezin li Rojhilata Bavîn bi pêşengiya vê partiyê bêne guhertin.

Girîngiya vê kongireyê, ev bû ku yekemîn kongireya piştî hevgirtina her du aliyên Dêmokrat û piştî serhildana Jînayê bû. Piştî hevgirtina her du aliyên Dêmokrat, niha ew kongireyek rewa ye.

Ev partî, heman partî ye ku Komara Kurdistanê damezrand û piştî têkçûna Komarê jî, di xirabtirîn rewşan de çalakiyên xwe bi şêwazên cuda domandine û her di çeperê de berdewam bû.

Dagirkar di heyamên derbasbûyî de ditirsiya ku xelk dîsa rabe ser piyan, lewma jî ji bo rêderkirina raya giştî, givaşên li ser tevgera Kurdî zêde dikirin. Yek ji mezintirîn givaşan jî hestyarbûna dagirkar bi kongireyê bû.

Lê avakera Komara Kurdistanê dev ji xebata ywe bernade û kongire lidar xist.

Sala 1942’an li Mahabadê kovara bi navê Nîştiman bi beşdarbûna 11 kesan hate weşandin û weke rojnameya fermî ya Komeley Jiyanewey Kurd (Komeley J.K) hate binavkirin. Vê kovarê li ser hesta netewî ya Kurdan kar dikir. Navê vê komeleyê dihate wateya vejandina Kurdan. Piştî sê salan di sala 1945’an de bi pêşengiya Qazî Mihemed, Komeleyê dewsa xwe da Hizba Dêmokrat a Kurdistanê û daxwazên vê partiyê, serxwebûn, perwerdeya bi zimanê dayîkê, fermîbûna zimanê Kurdî û gelek xwestekên din bûn.

Roja 22’ê Kanûna Paşîn a sala 1946’an a Zayînî angu 2’ê Rêbendanê a sala 1324’an a Rojî, Komara Kurdistanê ji aliyê Qazî Mihemed ve li meydana



Çarçira li bajarê Mehabadê yê Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin û wê hikûmeta Kurdî, ala netewî ya Kurdistanê hilda. Di vê rêwresmê de Qazî Mihemed wiha sûnd xwar: “Bi mezinatiya Xwedê, rûmeta Qurana Kerîm û li ser welat û ala xwe sûndê diwxem heta dilopa dawî ya xwîna min û nefesa min a dawiyê, bi can û malê xwe, di rêya azadiyê de, ji bo ku alên me li esmanan pêl bidin, ezê xebatê bikim.”

**Komar, ji aliyê heman partiyê ve hate avakirin ku niha jî piştî vê dîroka dirêj, hîn di xebatê de berdewam e û bûye şanaziya Kurdan.**

Piştî ku sala 1941’ê rêjîma Şayê Farsan, Riza Şa bi derbeyekê ket û kurê wî Mihemedriza bû desthilatdarê rêjîmê, wê demê serokeşîrên Kurdan ên ku ji Kurdistanê hatibûn dûrxistin , zivirîn Kurdistanê û hewl didan desthilat û rêveberiya navçeyên xwe bigirin destên xwe.

Êdî rojavayê Îranê ketibû bin desthilata Kurd û Azerbaycaniyan de û Rûsî jî derbasî navçeyê bibûn.

Piştî ku di 22’ê Kanûna Paşîn a1946’an Komara Kurdistanê hate ragihandin, Leşkerê Kurdistanê angu Artêşa Kurdistanê hate avakirin ku heman Hêza Pêşmerge bû. Ew hêz ji hezaran gencên Kurd û ji leşker û hêzên wan eşîran pêk dihat ku tevlî Komara Kurdistanê bibûn û her du hêzên siwar û peya lixwe digirtin.

Hêzên Rêjîma Şayê Farsan, bi destekа Brîtanyayê di roja 17’ê Kanûna 1946’an de, leşkerên xwe birin aliyê Kurdistanê. Wê demê, ji bo ku xelk neyê komkujkirin, Qazî Mihemed, berdewamkirina riya xwe sparte hevalên xwe û êdî komar hate hilweşandin û Qazî Mihemed xwe radest kir piştî heyamekê jî hate şehîdkirin.

**Ji wê demê ve Hizba Dêmokrat gelek hewraz û nişîv derbas kirin. Lê ev hizb qet bejna xwe li ber dagirkar natewîne û dê her di xebata xwe de berdewam be.**

Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê, heman hêza mezin e ku bi destpêşxeriya wê, çendîn civatên weke Kongireya Neteweyên Îrana Fêdêral û Şêwra Îrana Dêmokratîk ji bo Erebistan (Ehwaz), Belûçistan, Azerbaycan, Luristan û Kurdistanê pêk hatine.Ev, hemû hewl û têkoşînên berdewam ên PDKÎ ne ji bo pêkanîna eniyeke mezin li dijî dagirkariya rêjîma Îranê li navçeyên nefars. Lewma jî dagirkar, dujminê xwe nas dike û hewla astengkirina kongireya PDKÎ dida.

Şoreşa Jînayê jî berdewamiya heman gotara netewexwazî ye ku ev 80 sal in bi destpêşxerî û pêşengiya Hizba Dêmokrat birêve diçe. Lawan li ser kolanan digotin: “dagîrkerî Êranî, qatilî Jînamanî.”

Tevî ku niha piştî 3 salan serhildan hinek sist bûye û xwepêşandanên navxwe weke berê nemane, lê belê li navçeyên cuda bi awayên ciyawaz, şoreş li dijî dagirkariya rêjîma Îranê berdewam dike.

Partiya Dêmokrat a Kurdistana Îranê ne piştî herifîna Komara Kurdistanê, ne piştî şehîdkirina Qazî Mihemed, Dr. Sadiq Şerefkendî, Dr. Ebrulrehman Qasimlû, ne jî piştî dehan caran êrîşa bi hajekan a li ser binkeyên Hizbê, bejna xwe netewandiye û dê di serhildan û xebata xwe de li dijî dagirkar berdewam be.

# Gotûbêja li ser danasîna çar kitêbên dawî ji berhem û nivîsa Seîd Veroj

## 4. Elî Îlmî Fanî (Fanîzade)



**N.Seîd Veroj**

Elî Îlmî, lawê Abdulbaqî Mehmed Fanî Efendî ye. Abdulbaqî Mehmed Fanî, lawê Ehmed Înayettulah Efendî yê Silêmanî ye. Malbata wan bi paşnavê “Fanî” û “Fanîzade” têne naskirin.

Abdulbaqî Mehmed Fanî, bi tevî kekê xwe yê Kerîm Fanî, di dawîya salên 1860an de ji Silêmanîyê koça navçeya Tersûsa Edenê kirine û paşê ji wir ve çûne Qadirlî (Zülkadirye) ya bi girêdayî sencaxa Qozanê û li wê derê bi cî bûne.

Ji Abdulbaqî Mehmed Fanî û Eyşe Sidiqa Xanimê heft law çêbûne: Elî Îlmî, Baqî, Selahadîn, Zeynelabidîn, Ahmed Fazil, Elî Sebahedîn û Mesûd Fanî.

Di rewşa wê demê de, hemû zarokên wî yên lawîn jî tehsîla bilind kirine.

Ji heft lawên Ebdulbaqî Mehmed Fanî, sisêyê wan endamên CTKê bûn; Elî Îlmî Fanî, Zeynelabidîn Fanî (Îrfanî) û Mesûd Fanî.

Elî Îlmî, di 13ê Mijdara sala 1877an de li qezeya Qadirlîyê ji dayik bûye û navê dayika wî Eyşe Sidiqa Xanim e.

Ee her sê bira di nav rêzên Cemîyeta Hêvî ya Talebeyê Kurd, Cemîyeta Tealîya Kurdistanê û Xoybûnê de tevlî xebata sîyasî û rewşenbîrî ya Kurd bûne.

Ji ber mixalefeta dijwar a li hemberê Îtihad-Teraqî û tevgera Kemalîst, her sê bira jî di sala 1924an de, ji ber fikr û xebata xwe ya sîyasî û rewşenbîrî hatine sirgûnkirin.

Wekî gelek takekesên Kurdên wê demê, sê bira jî, berîya ku lîsteya 150an bête îlankirin, terka cî û warê xwe kirine.

Navê “Elî Îlmî û birayên wî Mesûd û Zeynelabidîn Fanî yê katibê dawî yê CTK ketîye lîsteya 150an.” Sedat Bingöl dibêje: “Ev her sê bira, bi fikr û kiryarên xwe, mixalifê Têkoşîna Mîllî bûn.”

Mafê welatîbûnê ji dest wan hatîye girtin û her sê bira ji bêgavîyê sînorên Cimhuriyetê terk kirine û her yek bi alîyekî ve çûye.

Elî Îlmî û Mesûdê birayê wî berê xwe dane Binxetê û li Sûriyê bi cî bûne.

Zeynelabidîn jî wekî gelek mixalif û sirgûnan, pêşîyê çûye Misrê û paşê ji wir ve çûye bajarê Mekkeya Erebîstana Sûdî û ji wir berê xwe daya başûrê Kurdistanê.

Piştî ku li Tirkîyê qanûna paşnavan tête qebûlkirin, malbata “Fanî/ Fanîzade”yan paşnavê “Bilgili” girtine.

Birayê gewre Kerîm jî, paşnavê “Doğan” girtîye û ew bi navê Kerîm Fanî Doğan tê naskirin.

Zaroktîya wî li Qadirlîya Edenê û li çiyayê Qozanê derbas bûye, Elî îlmî ji bo dema zarokîya xwe weha dibêje: “Zaroktî û rojê min ên bextewar, li serê çîyayê Qozanê li bin sîya darên Mezdekî derbas bûye.

Dema ku min vê dara xweşik bidîta, di ber gulîyên wê de min hemû êş ji bîr dikirin.

Êdî di devê min de ne tehma gezoya (gezengîya) li ser mazîyên çîyayê Rewandizê û ne jî tehma xurmeyên bi navûdeng ên qeraxê Dîcleyê dima.”

Wî, Îdadîya Mulkîye ya Edenê bi dereca herî baş di roja 26ê 2yê Çileya Pêşî ya 1896an de xelas kirîye.

Bi zimanê Erebî, Farisî, Tirkî dixwend û dinivîsand û aşînayê zimanê Fransizî bû.

Ew bi Gulîzar Xanimê re zewicîye û sê zarokên wan çêbûne bi navê: Urfî, Arif û Xalîde Pakîze.

Elî Îlmî mixalifekî dijwar ê îstibdadê û terefdarê meşrûtîyetê bû.

Li gor dîtina wî, rejîma îstibdadê ji bo hemû miletên Osmanî esaret bû û têkçûna wî, şikandina zincîrên zulmetê ye.

Di wîlayetê de demeke dirêj memûrtî kirîye. “Piştî ragehandina Meşrûtîyeta Duyemîn, ew, di navbera dîroka 18ê Nîsana 1912-4 ê Tebaxa 1912an de, li ser navê Qozanê ji bo Meclîsa Mebûsan hatîye hilbijartin û tevlî xebatên meclîsê bûye.”

Bi tevî astengî û dijberîya Îtihad û Teraqî, hilbijartina wî ya ji bo Meclîsê Mebûsan pirr balkêş e. Di hilbijartina wî de, piştgirîya Ermenên Edenê tesîrek girîng kirîye.

Digel ku di şiklê pirtûkê de eserekê wî nîne lêbelê Elî Îlmî Fanî hosteyê qelemê bû, rojnamevan, şair û edîb bû.

Xweyîtî, sermuharîrî û nivîskarîya gelek rojname û kovaran kirîye. Wî, di rojnameyan de bi navê Elî Îlmî û bi navê mustear ê Dervîş Sukûtî nivisîye.

Beşekî van rojnameyan berîya Meşrûtîyeta Duyemîn hatine neşirkirin û beşekî din jî ji meşrîtîyetê şûn ve hatine neşirkirin.

Elî Îlmî, di temenekî pirr ciwan de dest bi nivîskarî û rojnamevanî kirîye, di çapbûn û derçûn û nivîskarîya çendîn rojname û kovaran de ked û mesayîya wî heye.


Wî di bîst û yek salîya xwe de (1898) dest bi nivîskarîya rojnameya Seyhanê kirîye. Seyhan, rojnameya resmî ya wîlayeta Edenê bû.

Ew, paşê di sala 1905an de dibe sermuharîrê vê rojnameyê.

Piştî Seyhanê, rojnameya duyem a ku Elî Îlmî hem mesûlmidurî û hem jî sernivîskarîya wê kirîye, rojnameya Rehber-i İtidal e.

Hejmara yekemîn a Rehber-i İtidal, di roja 20 Teşrîna Sanî ya 1324an (3yê Çirîya Paşîna 1908an) de hatîye çapkirin.

Ev rojname, bi polîtîkaya weşana xwe, dijberê rojnameya İtidal a Îtihad û Teraqî (ÎT) hatîye neşirkirin.




Di vê kitêbê de, bi giranî li ser rojnameya Ferdayê hatîye rawestandin. Rojnameya Ferda ya Elî Îlmî, piştî îmzekirina Peymana Mondrosê (30.10.1918) hatîye neşirkirin.

Di nav rûpelên Ferdayê de, polîtîka û rêxistina ÎT û tevgera Kemalîst wek “serhildanek” li hemberê padîşayê Osmanî hatine nîşandan û herweha ew wek “çete”, “serserî”, “eşqiya” û “xwînrêj” hatine binavkirin.

Weşana rojnameya Ferda, nêzîkê sê salan berdewam kirîye û li ser hev çend jimar hatine çapkirin baş nayê zanîn, di arşîvan de jimara 279an jî xuya dibe.

Li ser bergê jimara 272, dîroka 17ê Teşrîna Ewela 1337 (17ê Çirîya Pêşîna 1921an) “sala sisê” hatîye nivîsandin.

Bi îhtimalek mezin, di dawîya sala 1921an de, ji Edenê hilkişandina hêzên Fransiz şûn ve, weşana rojnameyê hatîye rawestandin.

Piştî rojnameya Serbestîyê, Ferda, rojnameya duyemîn a herî temendirêj e ku ji alîyê kurdekî endamê CTKê ve hatîye neşirkirin.

Ew be efûya sala 1938an vegerîya Tirkiyê û di roja 25ê Tebaxa 1964an de li Qadirlîya Edenê koça dawî kirîye.

# Kurd bo bisilmanên din çawa qencî û pakiyê dixwazin divê bo xwe jî bixwazibin



N. Kofîxwar

Dibe ku xeynî kurdan her kî ku li ser axekê desthilat be li wê derê şûrê wî yê bibire heger li ser wê axê bibe xweyî dewlet jî bo berjewendî û dahatûya dewleta xwe wext bê her kesî di ber şûrê xwe re derbas bike, Heta xizm xizmetkarên xwe jî bi hêsan xerc bike, wê tu poşmanîyê jî nekşîne.

Çiya bigir heta deşt û zozan û çem û golan tevahî serê erdê û binê erdê;Kurdistan hezar salan zêdetir e di binê lingên dagirkeran de dinale ji sedema zengîniyê wê. Di her qonaxê de şer,kuştin,pevçûn jê kêm nebûye.

Ji rojava û rojhilata wê ji başûr û bakûra wê bi her aliyê ve di binê êrîşê de maye. Bes Heta lawaz neketiye li ber dijmin û dagirkeran tu carî serê xwe netewandiye.

Kurd li ser axa xwe desthilat mane. Eşîr bi eşîr bi yekîtiya wan xweyî dewlet û împaratoriyan bûne. Dema êrîş hatiye li ser yekî jî yekser bi artêşê xwe ve -artêşa ku sîya wan li ser dijiminan sam,xof dihîştîn- çûne alîkariya wan.

Ziman,ol û bawerî û çanda wan yek bûye. Bi saya ev nirxên giranbûha koka xwe, ax û rûmeta xwe parastine.

Ji ber vê hevgirtin, piştgirtinê êrişkarên Kurdistanê piştî serkevtinekê lewre pêşiyê berê xwe dane malmezin, serokeşîr û hizirmendan.

Ji bilî bi hezar serjêkirinan ewan jî bi hovane di ber şûr xwe re derbas kirine, piştre jî laşê wan li serê rêyan bi dar ve kirine û bi rojan jî di dar de hiştine. Xwestine bi wî awahî rûmeta kurdan bixînin, kurdan bê hêz bihêlin.

Mînak fermandarê Ereb yê bi navê wî Xalîd Bîn Velîd gava êrişî Kurdistanê dike Ji Diyarbekirê 50î hezarî, Ji Rihayê heta Sêrtê 180 hezarî kesan di şûr re derbas dike paşê jî wek gotina jorîn bi dar ve dike. Herdîsa hizirmendên kurd Hallacı Mansur ku sedema hizir û ramanên xwe dema desthilatiya Abbasiyan Xwedê nenas tê îlan kirin bi sizayeka mezin ew jî bi hovanê tê kuştin.

Pêşiyê bi şiftalê,piştre jî goştê wî zindî zindî perçe perçe dikin paşê bi vî hawî laşê wî bir dar ve dikin. Dawiyê jî serê wî jê dikin. Bi ev kiryarên hovane ve xwestine kurdan bitirsînin bê serî bê hiş, bê rêvebir bihêlin.

Wek îro jî li Rojhilatê Kurdistanê rejîma mellayan ji ber tirsa serkevtina kurdan her roj ciwanên kurd bi dar ve dikin, Ku ewan pêşeroja kurdan in.

Têrê nekiriye dagirkeran li cihên dagirkirî bi teva daristan, pirtûkxaneyan şewitandine.

Qesr û bermayiyên dîrokî şelandine, zirarên mezin lê dane. Ziman û dînên Kurdan qedexe kirine, bi ol û baweriyên xwe bi tev zimanê xwe ve bi ser kurdan ferz kirine.

Ku yên zanê dizanin ziman û dîn ji berê heta îro bona hevgirtina neteweyekî çiqasî girîng bûye. Ku di dîrokê de û di roja îroyîn de jî tê dîtin ku kengî ziman biçe çand, bîr û bawerî, hişmendiya neteweyî jî diçe.

Heta îro tenê bi zorê darê bi deqûdolaban ve dagirker û mêtingeran Kurdistan bi dest xistine, kirine mêtingeh. Helbet sedema sereke zengîniya Kurdistanê ye.
Le her çi kirine dîsa kurd her carê rabûne li ser xwe, xweyî xwe derketine. Dubare dikin dijmin kengî di şer de bi ser neketiye çûye rêya fen û deqûdolaban.

**Dilpakî, İnsanetıya kurdan bûye bela serê kurdan. Ji ber ku bi mêranî şer kirine, her çiqas dijmin be jî zirar nedane însanên sîvîl, li ser soza xwe sekinîne. Bes li hemberî wan dijmin jenosîdkar bûye, tu carî li ser soza xwe nesekinîne.**

Kurd li wan xapiyane. Ji ber wê êdî kurd neçar in ku çavên xwe vekin, hişyar bimînîn. Hema bibêjin Asûriyan, Farisan, Ereban, Mongolan heman tişt kirine bi kîryarên qirêş ve dijberî, dubendî kirine li nav kurdan.



Wek mînak bisilmanî -ku dînê qewmê Ereban bû piştre bû ideolojiya dewletên wan- li nav kurdan belav kirin helbet bi zorê darê. Perestgehên dînên wan ango Zerdeştî, birc û qûbên agir yên perestî û pîroz hilweşandine, kurd mecburê bisilmaniyê kirine.

**Yekem car dibe yekdîniya kurdan ji holê radibe. Bi rêya dîn ve kurd nêzî xwe kirine. Bisilmanên kurd jî pêşiyê ji zerdeştiyan piştre ji êzidîyan, bawermendên Rêya Heq ango Yaresanan qetiyane.**

Halbûkî dîn/ol riheka kurdan ê neteweyî ye. Ji ber ku dînê kurdan di hundurê xwe de çanda kurdan diparast. Dînê kurdan li gorî rê û rismên wan li gorî derûnî û kesayetiya wan bû. Nişaneyên neteweyî tê de hebûn. Kurdan bi rêya dîn ve jî wek Cihû û Ereban xwe li hev girêdidan. Dîn pêvereke neteweyî bû, Ku paşê di dîrokê de giringiya wê yê rû bide.

Kurdên çawa bi çendîn caran bi fen û fêlên dagirkeran ve bi îdeolojiya biratiya bisilmaniyê ve bêne xapandin? Bi pakitiya dilê xwe wê çendîn caran pêşiya mêtîngerên xwe vekin, pişta wan bigrin? Êdî kurdên bisilman ji ereb, faris, tirkan re bibêjin "Em giş umetên Mıhammed in, birayê hev in,"Lê tu carî birayên wan ên bisilman ewan wek bira nebînin. Wê tu carî bo wan qenciyê nexwazin.

Wê her carê kurdan ji bo berjewendiyên xwe xerc bikin, li Kurdistana pîroz dagir bikin, desthilatiya kurdan di destên wan hildin, Wê her mafên neteweyî, mafên bingehîn bin pê bikin.

Wek dizanin Bisilmanî li nav ereban derket, Ereban li gori çand, nêrit û dabitên xwe şêwandin, kirin dinê neteweya xwe. Berî her tiştî zimanê Kuranê Erebî ye. Bi saya din qebîleyên xwe yên belawela li hev kirin, bi vî xercî yekîtiya herî mezin ango dewleta xwe ava kirin. Osmanî , Farisî û Tirkan jî li gorî hizr, raman, doza xwe ye neteweyî bisilmanî şêwandin kirin îdeolojiya xwe.

Bi wê zêdetir Osmaniyan bi ser de xilafet bi dest xistin. Her çiqas kurdan ji der ve bisilman bes ji hundur ve wek zerdeşt, êzîdî, yaresan/Rêya Heq jîya bin jî belê pêwîst e bisilmaniya xwe ne wek Ereb, Faris,Tirk an neteweyekî din, wek kurdekî bijîn. Madem ku berî her tiştî kurd kurd in, divê bisilmaniya wan jî berjewendiyên kurdan biparêze li gorî neteweya wan be ne li gorî yên din. Kurd bo bisilmanên din çawa qencî û pakiyê dixwazin . Divê bo xwe jî bixwazibin.
Bi hêviya serkeftinê.

# Patron û Îsamîbûn



N. Vênûs Fayêq
W. Hesen Mukerem




Berê ji me re digotin em bixwînin bibin doktor wek kurê filan, bibin mamoste wek keça filan û hwd.

Ev mînaka kesên din ji bo xwe û zarokên me ye ku me dişewitîne.

Beriya niha bi salan li ser pirsa rojnamevanekî ku ez di kîjan dibistana edebî de me û nimûneya min kê bû, min got:

Min ji wan qutabxaneyan mifah wergirtiye, lê di dawiyê de min xwe bi pêş xistiye û peyrewî ji ti qutabixaneyekê nakim, ez hest dikim ku tenê ez bix we me..

Tiştek di sînga min de li rêyekê digeriya, bavê min, ku teşwîqê min ê yekem bû, qet ji min re negot ez bixwînim wekî filan bibim, an jî bibim nivîskar û helbestvan.

Wî tu derî ji min re venekir û tu patronên wêjeyî li ser min ferz nekir ku ez li ser şopa wî bimeşim dev jê berda mn bixwe rêya xwe peyda kir û min xwe çareser kir û tenê ez hînî xwendindinê kirim..

Jixwe, pir girîng e ku em dixwazin bibin xiristiyan, nehêlin yên din li şûna me biryar bidin, xwe nedin dest û biryara cîhana xwe bidin.

Di destpêka xebata min a rojnamevaniyê de, rojnamevanek gilî kir ku çima min qet navê kesekî ku qaşo rêberiya min kiriye wekî mamoste nekiriye.
Digel ku wî bi qasî ku dixwest riya xwe li ser min ferz bike talîmat neda min, ew ne mamosteyê min bû, zincîreyek ku dixwest min bi dar ve bike girtibû.

**Di civaka me de, li şûna ku em bi xwe bin, me hînî cihê xwe dikin..Şopa wan kesên ku qutabixane bûn û divê em aîdê yekî ji wan bin, yan jî yên ku xwe wek mamoste û rêberên me nîşan didin, ya ku di vê navberê de wenda dibe em bi xwe ne.**

Gava ku tu dihêlî yekî te biafirîne, gava tê û ji te re dibêje ger ne ez bûm tu nedibûya nivîskar.

Ji bo kêfê, hûn nekarin di her warî de li ser mezinkirina behre û şiyanên kesên din bixebitin, belkû nahêle hûn bibin xwe.

Yên ku ji xwe re dibêjin Îsamî, ku di warekî de xwedî behreyek bûne, hawîrdorek heye ku divê wan teşwîq bike û piştgirî bide ku ew bibin xwe, lê bi navê teşwîqê dixwazin tiştekî din ku nexwestine biafirînin li ser navê rênivîniyê wan bixapînin...
Hitler got, “Wateya nav û nîşan çi ye? Ji min re nav û nîşan hewce nake.

Navê ku min afirandiye nîşana min e. Tenê hêvî dikim ku nifşên paşerojê fêm bikin ku min bi dilsozî ji bo bernameya xwe xebatkiriye, lê ew çiqas hêsan û watedar e, Ji ber ku gelek in ku ji bo nav û nîşanan, naznav û pileyan hewl dane, û hene jî yên ku tîpa (D) ji bîr dikin ku bidin pêşiya navê (mamoste), yan li pêş navê mamoste ku dilşad in jî hene, ji xwe re dibêjin Îsamî di halekê de yekem îşaret Îsamiyan jixwe derbasbûne. . .

Ji ber vê yekê ji bo ku hûn Îsamiyan li her qadê bibînin, hûn wan li cîhe ronî nabînin, lê divê hûn wan di nav rêzên paşiya nav û nîşan û naznavan li kêlega stargehên efsûnî yên nediyar de bibînin.

Em vedigerin jiyanê, li cihekî, li qadeke ku divê em ji nû ve ji dayik bibin, em dixwazin ji nû ve ji bandora kesên din, wek xwe, ji nû ve ji dayik bibin, lê ew hewl didin me ji holê rakin, an jî herî baş ew hewl didin ku me li ser bingehek patronên gemar yên din biafirînin..

Çiqas xweş e ku em xwe li cihekî bi îradeya xwe îdia bikin, dema ku em bi çepikên zarokekî nezan kêfxweş dibin, ne ku li benda lêdana çepikan a mezin bin û li pesnê mînakên patronê xwe yê ji nû ve zayînê binerin.



# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê


## Binçavkirina xoseraneya welatiyan ji aliyê rêjîma Îranê ve berdewam e

Li berdewamiya binçavkirin a welatiyên Kurd ji aliyê hêzên îtilaat û navendên din ên ewlehiya rêjîmê, çendîn welatiyên din jî hatine binçavkirin û bo cihek nexuya hatine veguhastin.
Pêka rapora “Kolber News”ê roja Çarşemî 17ê Rêbendanê, hêzên hov ên îtilaat rêjîmê li bajarê Sinê de çalakvanê kedkarî “Kameran Saxtimanger” bi awayekî tundûtîj li şeqama “Camî” ya bajarê Sinê de binçav kirine û bo ciheke nexuya veguhastine.
Ji aliyê din ve li roja Sêşemî 16ê Rêbendanê, “Ehmed Hesenzade”, bavê Şehîd “Mihemed Hesenzade” bo derbaskirina 3 heyv sizaya sepandî ya girtîgehê, hate binçavkirin û bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Bokanê hate veguhastin.
Herwisa li vê rojê de welatiyekî xelkê bajarê Mihabadê yê bi navê “Kamil(Mihemed) Îsmaîlîazer” ku ji aliyê dadgeha rêjîmê ve bi tohmeta hevkarî digel Hizbeke Kurdî ya Rojhilatê Kurdistanê, 6 heyv girtîgeh bi ser de hatibû sepandin, bi awayekî hovane û tundûtîj, ji aliyê hêzên îtilaata rêjîmê li mala navbirê de li gundê “Qela Hesen”ê ser bi bajarê Mihabadê, hate binçav û bo girtîgeha rêjîmê li bajarê Mihabadê hate veguhastin.
Herwis roja Duşemî 15ê Rêbendanê, welatiyekî xelkê bajarê Seqizê yê bi navê “Hawrê Şafi`î” yê temen 40 salî, ji aliyê hêzên hov ên îtilaata rêjîmê li bajarê Seqizê de bê belgeya yasayî û bi awayê xoserane li cihê karê wî de binçav kirin û bo ciheke nexuya veguhastin.




## Rêjîma Îranê li heyva derbasbûyî ya zayînî de zêdetir ji 108 welatiyên Kurd girtine

Rêjîma Îranê li 11ê Befranbar heta 11ê Rêbendana 1403 a Rojî, zêdetyir 213 kes li Îranê de binçav kirine ku zêdetir ji 108 kes ji wan girtiyan, welatiyên Kurd in.
Pêka amara “Hengaw”ê li heyva January 2025 a zayînî, benaber bi 11ê Befranbar heta 11ê Rêbendana 1403 a Rojî, rêjîma Îranê zêdetir ji 213 kes ji xelkê Îranê binçav kirine ku zêdetir ji 108 kes ji vê amarê, welatiyên Kurd in.
Ev amare wan haletan li xwe digre ku nasnameya wan bo “Hengaw”ê hatine eşkerekirin û renge amare serast gelek ji vê amarê zêdetir be.
Pêka vê raporê, zêdetir ji 20 çalakvanên jin, 3 zarok, 108 welatiyên Kurd, 48 hevwelatiyên Ereb, 32 hevwelatiyên Belûç, 26 çalakvanên olî yên Sunnî û 11 çalakvanên Behayî, ji aliyê hêzên îtilaat a rêjîma Îslamiya Îranê ve hatine binçavkirin an revandin.
Herwisa zêdetirîn amara binçavkirinan li parêzgehên “Xûzistan 50 halet, Urmiye 46 Halet û Sine 42 halet” zêdetirîn amara binçavkirinan hebûne.
Pêka vê amarê zêdetir ji %51 a binçavkiriyên li seranserê Îranê ji 11ê Befranbar heta 11ê Rêbendanê anku heyva “January”2025, welatiyên Kurd in.
Li heyva “January” 2024 de 152 kes li seranserê Îranê de hatine binçavkirin, bi berhevdanîna amara heyva January 2024, digel heyva January 2025 ku 213 halet in, 60 halet anku nêzî %40, amara binçavkirinê zêdetir bûye.




## Rêjîma Îranê kolberek li sînorê bajarê Merîwanê, kuşt

Kolberekî xelkê bajarê Kamiyaranê ji aliyê hêzên hov ên sînorî yên rêjîma Îranê li sînorê bajarê Merîvanê bû armanca rasterast a gulleyan û hate kuştin.
Pêka rapora “Kolber News”ê şeva 8ê Rêbendanê, kolberekî temen 21 salî yê xelkê gundê “Zêwiye” ser bi bajarê kamiyaranê yê bi navê “Mehyar Seferî” li sînorê “Hencîran”ê ser bi bajarê Merîwanê, ji aliyê hêzên sînorî yên “henga merzî” ya rêjîmê ve, bi çeka kilaşînkofê û bi awayê rasterast teqe li wî kirine û ew kuştine.
Pêka vê raporê, termê wî kolberî piştî 3 rojan ji kuştina wî hatiye peydakirin.
Hêzên dije mirov ên henga sînorî piştî teqekirin li wî kolberê ciwan, ew bi cî hiştine û piştî derbasbûna 3 rojan termê wî hatiye peydakirin.
Pêka amarên “Kolber News”ê li sala 2024 a Zayînî de li deverên sînorî, rêyên li navbera parêzgehên “Urmiye, Sine û Kirmaşan”ê, bi teqeya rasterast a hêzên rêjîmê, renî û sir û seqemê, ketin bi ser mîn, veresiyan ji bilindahiyan û bûyerên din, 59 kolber hatine kuştin û 286 kolber jî hatine birîndarkirin.
Pêka vê amarê %75 a wan kuştî û birîndaran bi teqeya rasterast bûye û ji vê amarê 22 kolber anku %6 temenê wan jêr 18 salî bûye.



# Agirî

- Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
- www.Kurdistanmedia.com
- www.Agirimedia.org
- rojnamaagiri@gmail.com
- www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (487)

